

Gotina Komela Rewşen Bedirxan Ya Jinê Di Bîranîna Damezrandina Yekem Partiya Kurd Li Sûriya

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê-Encûmena Efrînê bi bûneya damezrandina Partiya Dêmkrata Kurdistan li Sûriyê ,di roja 15.06.2012 an de fêstîvalek mezin bi amedebûna cemawerê Çiyayê Kurmênc li darxist , Bêrîvan Îbo bi navê (komela **Rewşen Bedirxan** ya jinên Kurd Li Efrînê) peyva pîrozbahiyê di festîvalê de xwend.

Endamên Encûmena Niştimanî Kurd li Sûriyê !....

Hemû Partiyên Kurd li Sûriyê !....

Cemawerê gelê Kurd li Çiyayê Kurmênc ! ...

Em (Komela Rewşen Bedirxan ya jinên Kurd li Çiyayê Kurmênc) bi bûneya damezrandina (Partiya Dêmkrat a kurd li Sûriyê) di 14 . Hizêranê , sala 1957 an de we pîroz dikin.

Welatparêzên têkoşer !

Wek hûn hemî dizanin , dîroka Firansa li Sûriyê reş bû, ewê cidabûn ne dikir navbera gelên Ereb û Kurd , lewra gelê Kurd jî mîna azadîxwazên Ereb bi hemî kanînên xwe li dijî koledara Firansa têkoşîna xwe ya dadmend dikir û ji bo azadiya Sûriyê bi camêrî pir qurban pêşkêş kir.

Lê piştî ku Sûriyê ji koledara Firansa rizgar bû, destlatdarên Sûriyê pir zû gelê Kurd ji bîr kir û ewanan nexwastin vê nasnam me ya netewî nas bikin , bi ser vê de jî, destlatdarên li duhevhatî zordarî û setemkarî li milletê me dikirin. Di encama vê bindestî û ne wekhevîyê de, hin siyasetmedarên Kurd mîna nemir Osman Sebrî , nemir Reşît Hemo,rêzdar Ebdil Hemîd Hac Derwîş, Dr. Xelîl Mihemed û hin din di 14 .H izêranê ,sala 1957 an de (Partî Dêmkrat a Kurd li Sûriyê) damezrandin .

Di rstiyê de, ji sala 1965 an de û mixabin

gelek partiyên me yê siyasî li Sûriyê ava bûne, lê van partiyên têkoşînên xwe li dijî hemu destlatdarên şoven , regezperest berdewam kirin û ewanan bi qaserî kanînên xwe li dijî pirojeyên regezperest wek hejmartina awerte ,kembera Erebî û erebkirina navên gundên Kurdan bi tundî rawestiyên.

Gelî beşdaran !

Niha bû ye ser çel sal re , gelên Sûriyê Ereb , Kurd û kêmetewên din di bin sîbera destlateke zordar, kevneperest û regezperest de dijî , lewra cemawerê komara Sûriyê li seranserî welêt ji 15. Avdara 2011 ê de û ta roja îro di rewşeke şoregerî de dijî , bi 10 hezaran hemwelatîyên Sûriyê ji bo azadiyê , dêmkrtiyê û wekhevîya gelan pakrewan bû ne .

Em weke Komela Rewşen Bedirxan ya jinên Kurd li Çiyayê Kurmênc pêkanîna dêmkrtiyê û azadiyê tenê di hilweşandina rêcîma Bes de dibînin , lewra em jî, bê dudilî piştvanîya şoreşa Sûriyê ya aştîyane dikin û dengên xwe bi hemî dayikên Sûriyê , bi hemî saziyên jinan li Sûriyê û bi hemî patiyên azadîxwaz li Sûriyê re bilind dikin û dibêjin :_ Bijî azadiya gelên Sûriyê !

Bijî dêmkrtî û wekhevîya hemî gelan li Sûriyê û li Cîhanê!.....

Her bijî pakrewanên azadiyê li Sûriyê û li hemû cîhanê !....

Her bijî nemirên Kurd li beşên Kurdistanê !

Her bijî hevkarîyên gelê me li dijî zordarên welatê me !.....